Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 394 nameronahi@gmail.com 13- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# QSD'ê dewreya 7'emîn bi dawî kir







Li Akademiya Şehîd Ehmed El-Salim a QSD'ê 30 roj berê bi tevlîbûna 75 şervanî dewreya perwerdeyê ya heftemîn bi navê Şehîd Abid Mihsin hatibû destpêkirin.
Di dewreyê de dersên leşkerî û ramyarî hatin dîtin.
Bi armanca qedandina dewreyê merasîmeke leşkerî bi amadebûna fermandarên QSD'ê hate lidarxistin.
Di merasîmê de endamê fermandariya QSD'ê Ebû Leyla axivî û got: "Perwerdeyên siyasî û leşkerî ji bo şervanan pir girîng e da ku karibin rola xwe ya dîrokî di parastina welat û gel de bilîzin û layîqî xwîna şehîdan bibin. Em ê ji bo parastina welatê xwe di çeperên şer de yek rêz bin û em ê pilan û lîstokên dewletên komploger bi taybet dagirkeriya Tirk vala derxînin".
Di dawiya merasîmê de şervanan tevlî perwerdeyê bibûn sonda leşkerî xwarin...*ANHA*

## Dara berxwedêr: Dara Zeytûnê



Dara zeytûnê ya ku sembola aştiyê ye û heta berxwedana serdemê di gelek pêvajoyên dîrokê de cih girtiye ji bo gelê Mexmûrê jî bûye sembola hêz û berxwedanê.
Li Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) li deşta Mexmûrê bi germ û toza xwe tê zanîn, li gel wê avhewaya xwe ya çolê û pir germ jî gelek darên ku fêkiyên cuda cuda digihîn jî lê şîn dibin. Bi taybet darên mîna spêndar, tû, dîsa pirteqal, mişmiş, hêjîr, hinar û zeytûn ku her yek fêkiyên avhewayeke cudan ne lê şîn dibin. Ev darên fêkiyam tevî hewaya germ mîna gelê Mexmûrê li ber xwe didin û şîn dibin.
Herî zêde jî darên Zeyîtûnê yên di Berxwedana Serdemê de li hemberî êrîşan ji parêzvanên Efrînê re pelên xwe kirîn bendên parastinê, baş berhem didin. Ji bo tune nebin wekî Daristana Banyan riha xwe gihandiye her axê, heta deşta Mexmûrê jî hatiye. Her şaxê digihe axê bi xwe re daristanekê ava dike. Di dîrokê de her dem şaxên zeytûnan weke sembola aştiyê jî hatine dîtin û di pirtûkên pîroz de jî bi awayê pê sond tê xwarin derbas dibe. Dema mirov li nava wargehê digere, mirov dikare bibêje ku li ber deriyê her malekê darek zeytûnê heye.
Di germa Mexmûrê de zeytûn dara herî zêde berxwedêr e.
Dema mirov li girîngiya şaxên zeytûnan ya dîrokê jî dinêre dibîne ji bo rawestandina şer bûye sembola aştiyê û bi pîroziya wê sond xwarine. Pir caran ji ber toz û germa zêde darên din zer dibin û hişk dibin, lê zeytûn weke çiyayan serhildêr dimîne û ji tu bablîsokan re serî danayne. Her dem pelên wê şîn û qet têk naçe...*JINNEWS*

## Li Girbawî stada fotbolê hat vekirin

Li gundê Girbawî yê girêdayî Qamişlo stadeke futbolê bi navê Şehîd Metînbi merasîmekê hat vekirin.
Serokê Komîteya Aborî ya Meclîsa Şaredariya gund Mihemed Xelîl û endamê rêveberiya Meclîsa Rojava ya girêdayî Yekîtiya Werzîşê Fecîlî Cima di merasîmê de axivîn.
Di axaftinan de hat destnîşankirin ku armanca vekirina Stadê, geşkirina hemî çalakiyên ciwana ye. Her wiha axavtivanan spasiya xebatên şaredariyê kirin.
Pişt re Koma " Kulîlkên Girbawî" ya girêdayî Navenda Çand û Huner a gund dîlanên xwe yên folklorî pêşkêş kir.
Roja yekemîn a vekirinê bi maçek di navbera tîma Asayîşa Girbawî û tîma Asayîşa xetê gundan dest pê kir...*ANHA*





## Welatiyên Reqayê li nava zeviyên pembo ne

Cotkarên Reqa û gundewarên wê di vê demê de ji bo hilberîneke baştir bigirin xizmeta zeviyên pembo dikin.
Piraniya cotkarên Reqa piştî ku hilberîna xwe ya ceh û genim rakirin niha di nava zeviyên pembo de dixebitin.
Pembo di destpêka meha Nîsanê de li herêmê tê çandin û piştî demekê tê avdan û dema giya di nava zeviyên pembo de derdikeve, cotkar dest bi rakirinê dikin.
Piştî meh û nîvekê ji çandina pembo cotkar li nava zeviyan tayên pembo fer dikin.
Cotkarê bi navê Yasir El-Qatêh wiha got: "Em niha zeviyên xwe axşûv dikin û piştî demekê em ê zeviyên pembo derman bikin û careke din av bidin."
El-Qatêh bang li Komîteya çandiniyê kir ku alîkariya wan bikin da ku hilberîneke baş a pembo werbigirin.
Ji bo hilberîneke baş ya pembo pêdivî bi avdaneke baş heye...*ANHA*



## Di nava avê de bê av hatine hiştin



Parêzgeha Kirmanşan a Rojhilatê Kurdistanê di warê çavkaniyên avê de gelekî dewlemend e. Lê belê ji ber polîtîka û nêzîkahiyên rêjîma Îranê gelê herêmê nikare ji van çavkaniyan sûd bigire. Lewre bi taybetî di mehên demsala havînê de bê av dimînin û bi tankeran av li wan tê belavkirin.
Li gorî rapora mafê Mirovan ya Kirmanşan, rêveberiya Tehranê heta niha li ser çavkaniyên avê yên Kirmanşanê 9 bendav ava kirine. Her wiha amadekarî tên kirin ku 18 bendavên din bên çêkirin.
Balkêş e ku rêjîm bi riya van bendavan piraniya ava herêmê dikişîne parêzgehên gerim û bê av ên Îranê.
Li gorî rapora Saziya Çavkaniyên xwezayî yên Parêzgeha Kirmanşanê ku di meha Gulanê de hatibû amadekirin; ava bendavên Tekhemam, Azadî, Silêmanşah û Zagrosê pir zêde ye û di serde diçe.
Di heman raporê de tê gotin ku ava bendavan û yên din ji bo parêzgehên gerim û bê av yên Îranê tê şandin. Ji ber vê yekê jî gelê parêzgeha Kirmanşan nikare ji avê sûd werbigire.
Alîkarê Berpirsê Saziya Av û Kanalîzasyonê ya Kirmaşanê Feramerz Şohanî bal kişand ku ji sedî 80'yê ava Kirmanşanê ji bo parêzgehên din ên Îranê tê şandin û ji sedî 20 ji bo Kirmanşan dimîne. Şohanî destnîşan kir ku ev jî têra herêmê nake û da zanîn ku di demsala havînê de ew ji bo 350 gundên Kirmanşahê bi tankeran avê belav dikin...*ROJNEWS*

## Di hefteyekê de 27 gund û mezra hatin rizgarkirin

Navenda Ragîhandinê ya QSD'ê bîlançoya hefteya destpêkê ya hemleya rizgarkirina bajaroka Dişîşe ya Hesekê ku di çarçoveya Bagera Cizîrê hatiye destpêkirin, bi daxuyaniyekê eşkere kir. Di daxuyaniyê de hat gotin ku şervanên QSD'ê di hefteya destpêkê ya hemleya rizgarkirina bajaroka Dişîşa de 12 gund û hejmarek mezre rizgar kirin. Her wiha bi sedan welatiyên sivîl xelas kirin. ***R-2***



## Bila dewleta Tirk ji Babê derkeve

Meclîsa Leşkerî ya Babê bi daxuyaniyekê diyar kir ku dewleta Tirk li herêma Babê zilmê li welatiyan dike û derbarê kiryarên dewleta Tirk yên li Babê û bang li civaka navnetewî kir zextê li Tirkiyê bikin da ku ji Babê û Bakurê Sûriyê derkeve û welatî vegerin warê xwe. ***R-2***



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 394 13- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Em amade ne danûstandinan bikin



Hevseroka Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê Ilham Ehmed diyar kir ku ger rêjîma Sûriyê cidî be ew amade ne pêre danûstandinan bikin. Îlham wiha got, "Şer û rêbaza leşkerî wê çareseriyê ji aloziya Sûriyê re neyîne. JI destpêkê de em vê dibêjin û em hîn jî dibêjin ku em ji bo danûstendinên rasterast ên bi rêjîmê re amade ne." ***R-2***

# CÎHAN LI HEMBER EFRÎNÊ KERR Û LAL E



### BERPIRSYARIYA XWE BI CIH BÎNIN

Dewleta Tirk bi dagirkirina Efrînê re li ber çavên cîhanê sûcên mirovahiyê dike lê çav kor bûne, guh kerr bûne û kes dengê xwe dernaxe. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a kantona Efrînê bi daxuyaniyekê bang li Yekîtiya Ewropa, Konseya Bilind a Koçberan û rêxistinên navnetewî kir ku bi erka xwe rabin û berpirsyariya xwe ya ji bo gelê Efrînê yên ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk koçber bûne bi cih bînin.

### DAWÎ LI DAGIRKERIYÊ BÎNIN


Rêveberiyê Xweser wiha got, "Piştî ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên terorist êrîşê Efrînê kirin welatiyên sivîl ji neçarî berê xwe dan kantona Şehbayê. Çemberê rojanê li ser kantona Şehbayê teng dikin, rê nadin pêdiviyên jiyanî derbasî herêmê bibin. Em bang li rêxistinên navnetewî dikin ku destwerdanê bikin vegera welatiyan ya warên wan misoger bikin, her wiha dawî li dagirkeriya dewleta Tirk bînin. ***R-2***

## Hewl didin dagirkeriyê rewa bikin




Komîteya Têkiliyên Derve ya Koma Civakên Kurdistanê KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand diyar kir ku daxuyaniya endamê polîtburo ya PDK'ê Sefîn Dizeyî, hewldanek rewakirina êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê ye. Komîteyê got, "Yên ku bi salan e dibêjin 'Bila PKK ji Şengalê ji Başûr derkeve', rojekê bi tenê jî ji bo dewleta Tirk ne gotine ji Başûrê Kurdistanê derkeve." ***R-4***

## Minbicê têra wan nekir niha Qendîl xistine rojevê




Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mistefa Karasû diyar kir ku tifaqa AKP-MHP'ê li ber ketina ji desthilatdariyê ye û ji bo pêşî li vê yekê bigire jî, xwe li polîtîkaya geşkirina şovenîzmê girtiye. Karasû got, "nepixandina mijara Minbicê xuya ye têra AKP'ê nekiriye ku di hilbijartinê de bi ser bikeve, lewma niha operasyonek li dijî Qendîlê xistiye rojevê." ***R-5***

## Êrîş ne li dijî PKK'ê, li dijî gelê Kurd e



Çavdêrê siyasî Mehemed Emîn Pencewînî têkildarî hewldanên dewleta Tirk ya dagirkirina başûr axivî û diyar kir ku pêwîste Parlamentoya Herêma Kurdistanê û hemû aliyên siyasî yên kurd bibin yek, helwest nîşan bidin. Pêncewînîn got, "êrîşên Tirkiyê ne tenê li dijî PKK'ê ne, li dijî doza rewa ya Kurd e." ***R-5***

## Hilbijartina bi gopal




***R-4***

## Bîg Reîs



***R-6***

## Demîrtaş bersiv da derewên Erdogan



Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş bersiv da derewên Erdogan ên li ser bûyerên 6-8'ê Cotmehê yên ji bo Kobanê. Ya ku Erdogan pê diêşe, kuştina welatiyên me bi rengekî hovane nîne. Ya ku Erdogan gelekî pê diêşe, têkçûna DAÎŞ'ê li Kobanê ye." ***R-2***


## Dagirkeran li Efrînê 9 kes revandin

Kiryarên hovane yên artêş û çeteyên Tirk ên li Efrînê dewam dikin. Her roj mirovan direvînin, dikujin û destdirêjiyê dikin. Li gundên Kebaşîn û Birc Weqas yê Şêrawa yê Efrînê 9 sivîlên din hatin revandin. Çeteyan di berdêla berdana her kesekî revandî de hezar dolar xwestin. ***R-2***

## Komkujiya Enqereyê karê AKP'ê ye

Li gorî malpera Ahval, servîsa veşartî ya Yekîtiya Ewropayê EUINTCEN raporeke 'veşartî' amade kir û tê de destnîşan kir ku berpirsyarê Komkujiya Enqereyê ya 10'ê Cotmeha 2015'an de ku 103 kesan jiyana xwe ji dest dan, desthilatdariya AKP ye. ***R-5***

## AKP dixwaze pêşî li têkçûyîna xwe bigire



Hevserokê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku tifaqa AKP-MHP'ê ji bo hilbijartinan de deng bigirin operasyona li dijî Qendîlê xistine rojevê û got, "Dixwazin di ser cenazeyên leşkeran re tevahiya muxalefetê bixin pey xwe û HDP'ê bi tenê bihêlin." ***R-5***

## YNK wê piştgiriya hemû Kurdistanê bike

Şandeya Rojavayê Kurdistanê ya bi pêşengiya Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan li başûr serdana YNK'ê kir. Cîgirê Sekreterê Encumena Navendî ya YNK'ê Zubêr Osman diyar kir ku YNK piştgiriya xebata rewa ya aştiyane û demokratîk a parçeyên din ên Kurdistanê dike û helwesta YNK'ê nehatiye guhertin. ***R-4***

## Li dijî êrîşan Yekîtî pêwîste



Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê-Rêxistina Kobanê Mihemed Hebîb diyar kir ku dewleta Tirk bi êrîşên li ser başûr û rojava dixwaze îradeya kurdan bişkîne û got, "divê kurd ji her demê zêdetir li hember êrîşan yekbûna xwe pêk bînin." ***R-4***

## Li Meclîsê em ê bibin dengên gelan



Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan, di mîtînga Çewlîgê de ji hezaran re axivî û diyar kir ku HDP wê li meclîsê bibe dengên hemû gelan. Bûldan wiha got, "AKP û MHP bûn tifaq û xwestin Kurdan di bin bendê de bihêlin. Lê wê bi ser nekevin. Em ê li meclîsê bibin nûnerê gelan û van polîtîkayan pûç bikin." ***R-3***

## Ji Asayîşê daxuyaniya Cejna Remezanê

Rêveberiya Giştî ya Hêzên Asayîşa Rojava-Bakurê Sûriyê bi nêzîkbûna Cejna Remezanê bang li welatiyan kir ku li gorî biryar û rêzikên ku hatine derxistin tevbigerin. Revebêriya Giştî ya Asayîşê cejna welatiyan pîroz kir û xwest ku di mijara xebatên ewlekariyê de bi wanre bibin alîkar. ***R-6***

# Dawî li dagirkeriya Tirk li Efrînê bînin

***Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a kantona Efrînê bi daxuyaniyekê bang li Yekîtiya Ewropa, Konseya Bilind a Koçberan û rêxistinên navnetewî kir ku bi erka xwe rabin û berpirsyariya xwe ya ji bo gelê Efrînê yê ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk koçber bûne bi cih bînin.***

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a kantona Efrînê bang li Yekîtiya Ewropa, Konseya Bilind a Koçberan û hemû rêxistinên navdewletî kir ku erka xwe ya hemberî şêniyên Efrînê yên li Şehbayê dimînin bi cih bînin û dawî li dagirkeriya Tirk ya li Efrînê bînin.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Efrînê derbarê mijarê de daxuyaniyek li Kampa Berxwedan da. Daxuyanî bi beşdarbûna nûnerên Desteyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Efrînê, rêveberên komînan û endamên meclîsan û endamên Kongreya Star hate xwendin.

Daxuyanî wihaye:

"Piştî ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên terorist êrîşê Efrînê kirin welatiyên sivîl berê xwe dan kantona Şehbayê. Dewleta Tirk û çeteyên wê li dijî sivîlan hemû cûreyên çekan bikar anîn û ew neçar kirin ku ji warê xwe derkevin.

Welatiyan li kantona Şebayê ku derfetên herî kêm ê jiyanê lê nayê peydakirin, jiyana xwe dewam kirin. Di xaniyên hilweşiyayî, mayînkirî û kampan de bi cih bûn. Kampên li Şehbayê tu piştgiriyê ji tu rêxistinan, an jî ji tu aliyên navdewletî wernagirin. Lê belê bi derfetên xwe yên herî kêm xwe ji sermê û germê diparêzin.



Komplogerên ku bûn sedema derbederkirina welatiyên Efrînê, hê jî pîlanên xwe yên wan jihev qutkirin û derbederkirinê didomînin. Di riya şerê taybet re tirsê di nava welatiyan belav dikin îdayên ji rastiyê dûr da ku berxwedan û tekoşîna wan, her wiha helwesta welatiyan a berxwedanê têk bibin. Çemberê rojanê li ser kantona Şehbayê hê zêdetir dikin, riyan digrin û rê nadin alavên jiyanî yên pêwîst derbasî herêmê bibin. Di encama van siyasetan de hejmarek welatiyên sivîl ku piraniya wan jin û zarok in jiyana xwe ji dest dan. Beranberî vê yekê rêxistinên mirovî, bêdeng in.

Lewma em bang li Yekîtiya Ewropa, Komseriya Bilind a Koçberan û hemû rêxistinên mirovî dikin ku destwerdanê bikin da ku erka xwe beranberî şêniyên Efrînê yên neçarî derketinê bûne, pêk bînin. Destê alîkariyê dirêjî wan bikin û riya wan ya vegera warên wan misoger bikin, her wiha dawî li dagirkeriya dewleta Tirk bînin.

## Bila dewleta Tirk ji Babê derkeve



Meclîsa Leşkerî ya Babê bi daxuyaniyekê derbarê kiryarên dewelta Tirk yên li Babê û bang li civaka navnetewî kir zextê li Tirkiyê bikin da ku ji Babê û Bakurê Sûriyê derkeve û koçber vegerin warê xwe.

Daxuyaniya Meclîsa Leşkerî ya Babê li bajaroka Erîma ya girêdayî Babê ji aliyê Fermandarê Giştî yê Meclîsê Cemal Ebû Cûma ve hat xwendin.

Di daxuyaniyê de hat gotin;

″Aloziya li bajarê Babê û tevahiya Sûriyê dewam dike. Gelê me rastî zilma dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê tê. Em weke Meclîsa Leşkerî ya Babê careke din hebûna hêzên Tirkiyê li bajar û gundên me û Sûriyê şermezar dikin û weke dagirkerî pênase dikin.

Ev bûye du sal Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê bajarê me Bab dagir kirine. Piştî ku bajarê me dagirkirin, mal û mulkên şêniyên herêmê didizin, gel digrin û destûr nadin ku gel vegere bajarên xwe.

Herî dawiyê artêşa Tirk û komên çete li nexweşxaneya El-Hikme êrîşî karmend û hemşîreyên nexweşxanê kiribûn. Girtîgehên Tirkiyê yên li Babê niha ji gelê bêsûc tijî bûne. Ji ber ku li Babê jiyaneke aram û bi ewle nemaye şêniyên bajarê Babê û gundewarên wê neçar dimînin ku koçber bibin. Tirkiye li gel polîtîka tirkirina şêniyên herêmê destê xwe datîne ser malên şêniyan û weke navendên leşkerî ji xwe re bikartînin.

Em bang li civaka navnetewî dikin ku destwerdana Tirkiyê bikin û zextê lê bikin ku xwe ji Babê û Bakurê Sûriyê vekşîne.

## Dagirkeran li Efrînê 9 kes revandin



Leşker û çeteyên Tirk ên dagirker, li Efrînê 9 gundiyên din revandin. Ji bo berdana kesên revandî jî pere xwestin.

Kiryarên hovane yên artêş û çeteyên Tirk ên li Efrînê dewam dikin. Her roj mirovan direvînin, dikujin û destdirêjiyê dikin. Li gundê Kebaşin ê navçeya Şerawayê 5 sivîlên din hatin revandin.

Nayê zanîn bê kesên hatine revandin bi ku ve birine. Gundiyên hatin revandin: Îbrahîm Umer Heyder (30), Abdulhemîd Îsmaîl Heyder (28), Mihemed Hesen Ebdo (28), Adil Mihemed Şikrî (25) û Fadil Mihemed Şikrî (18).

HEZAR DOLARÎ DIXWAZIN!

Kesekî bi navê Ş.N. ê ji gundê Birc Weqas ê li Şerawayê ragihand ku artêşa Tirk û çeteyên wê, 4 kesên ku pezên xwe diçêrandin revandine. Kesên hatine revandin: Nezmî Elî (60), Elî Xelîl (45), Qedrî Beherî (60) û Mihemed (30).

Çeteyan di berdêla berdana kesên revandî de hezar dolar xwestin û 5 mih jî dizîn.

## Demîrtaş bersiv da derewên Erdogan




Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş bersiv da derewên Erdogan ên li ser bûyerên 6-8'ê Cotmehê yên ji bo Kobanê.

Demîrtaş ji Erdogan re got, "Eger tu fermana min a ji bo kuştina 53 kesî îsbat bike, soz ez ê xwe ji namzetiya Serokkomariyê vekişînim."

Demîrtaş bi rêya parêzerên xwe, di hesabê xwe yê Twitterê de bi sernavê "Derewên Erdogan ên li ser Kobanê" peyam weşand. Peyamên Demîrtaş wiha ne:

"Ji kerema xwe bi baldarî bixwînin û bibînin bê li hemberî me zîhniyeteke çawa heye. Dema destpêkirina provokasyon û şîdeta di xwepêşandanên Kobanê de, 5-6'ê Cotmehê nîne. Dema destpêkirina wan, 7'ê Cotmehê û piştî wê ye ku Erdogan wê rojê got, 'Kobanê li ber ketinê ye'. Piştî vê daxuyaniyê mirovan jiyana xwe ji dest dan. Der barê min û rêveberiya HDP'ê de ji ber bûyerên Kobanê dozeke bi tenê jî nehatiye vekirin. Hejmara mirovên di bûyerên Kobanê de hatine kuştin 53 nîne, hejmar 43 ye. 6 jê ji HUDAPAR'ê ye, 2 wezîfedarên ewlekariyê ne ku bi sûîqestê hatin kuştin, 2 jê penaberên ji Sûriyê ne, 33 jê HDP'yî ne. Ji bilî 6 endamên HUDAPAR'ê, li ser kuştina mirovên din doz û lêpirsîneke xurt nehatiye vekirin. Bûyerên Kobanê, berevajî îdîayên Erdogan piştî hilbijartina 7'ê Hezîrana 2015'an neqewimîne. 8 mehan berî hilbijartinê, yanî 7'ê Cotmeha 2014'an qewimîne. Piştî bûyerên Kobanê 5 mehên din jî di navbera me û Erdogan-AKP'ê de ji bo pêvajoya çareseriyê hevdîtinan dewam kirin. Yanî Erdogan ku îro me weke 'terorîst' nîşan dide, 5 mehan piştî bûyeran jî bi me re hevdîtin kir. Ji bo provokator û hêzên ku rê li ber bûyerên Kobanê vekirine eşkere bibin, me 12 caran pêşnûmeya pirs û lêkolînê dan Meclîsê, lê ji aliyê AKP'yiyan ve hatin redkirin. Ya ku Erdogan pê diêşe, kuştina welatiyên me bi rengekî hovane nîne. Ya ku Erdogan gelekî pê diêşe, têkçûna DAÎŞ'ê li Kobanê ye.

## Di hefteyekê de 27 gund û mezra hatin rizgarkirin



Şervanên QSD'ê di hefteya destpêkê ya hemleya rizgarkirina bajaroka Dişîşa de 12 gund û hejmarek mezre rizgar kirin. Her wiha bi sedan welatiyên sivîl xelas kirin.

Navenda Ragîhandinê ya QSD'ê bîlançoya hefteya destpêkê ya hemleya rizgarkirina bajaroka Dişîşe ya Hesekê ku di çarçoveya Bagera Cizîrê hatiye destpêkirin, bi daxuyaniyekê eşkere kir.

Daxuyanî wiha ye:

"Hêzên me hefteya yekem a hemleya rizgarkirtina bajaroka Dişîşa ya Hesekê bi dawî kir. hêzên me li herdû eniyên hemleyê yên rojhilat û rojava li gorî pîlana ji aliyê Odeya Çalakiyan ve hatiye amadekirin pêş ket. Di encamê de derbên mezin gihandin rêxistina DAIŞ a terorist. Hêzên me ji aliyê rojhiat ve 9 û ji aliyê rojava jî 13 kîlometreyan pêş ve çûn.

Di encamê de hêzên me 12 gund û hejmarek mezre ji çeteyan rizgar kirin. Bi sedan welatiyên sivîl ku di gundan de asê mabûn ji cihên şer hatin dûrxistin.

Di şerên 4 rojên dawî de jî hêzên me bi awayekî yekser bi teroristan re ketin şer. Balafirên koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê jî tevgera teroristan şopandin û bargehên wan yekser bombebaran kirin. Di şerê 4 rojên dawî de hejmarek terorist hatin kuştin, hin ji wan jî bi saxî ketin destê şervanên me..

## Em amade ne bi rêjîmê re danûstandinan bikin

Hevseroka MSD'ê Ilham Ehmed diyar kir ku heger rêjîm cidî be û gavan bavêje, ew amadene bi awayekî yekser bi rêjîma Sûriyê re bikevin danûstandinan.

Hevseroka Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê Ilham Ehmed derbarê pêşketinên dawî ku pêk tên ji ANHAyê re axivî û diyar kir ku ew amadene danûstendinên rasterast bi rêjîma Sûriyê re pêk bînin û wiha got: "Şer û rêbaza leşkerî wê çareseriyê ji aloziya Sûriyê re neyîne.



JI destpêkê de em vê dibêjin û em hîn jî dibêjin ku em ji bo danûstendinên rasterast ên bi rêjîmê re amade ne."

Hevseroka MSD'ê Ilham Ehmed di dawiya axaftina xwe de jî da zanîn ku heger rastî rêjîm amadebe dest gavên cidî bavêje ew ji danûstendinan re amade ne û got: "Riya siyasî tekane riya parastina yekîtiya xaka Sûriyê û dawîkirina şer e. Wiha dê şer bi dawî bibe û Sûriya ne navendî ya demokratîk ava bibe."



# Tekoşîna Sakîneyan jinan tîne ba hev

***Ji bo kadroya pêşeng a Tevgera Jinên Kurd û ya PKK'ê Sakîne Cansiz, Nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û Endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez ên ku di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê hatibûn qetilkirin, li Swîsreyê Festîvala Jinan hate lidarxistin.***

Jin li Zurîhê di Festîvala Jinan a Sakîne Cansiz a 5'emîn de hatin ba hev. Çalakgera ji Baskê Nekane di festîvalê de axivî û got, "Tişta ku jinan tîne ba hev, têkoşîna Sakîneyan e."



Ji bo kadroya pêşeng a Tevgera Jinên Kurd û ya PKK'ê Sakîne Cansiz, Nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û Endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez ên ku di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê hatibûn qetilkirin, li Swîsreyê Festîvala Jinan hate lidarxistin. Festîvala 5'emîn li bajarê Zurîhê tê lidarxistin.

Tevgera Jinên Kurd a Swîsreyê, Yekîtiya Jinên Sosyalîst, Yekîtiya Jinên Kedkar, SYKB, Mor Vereîn Fraûenlesbenkasama, Bewegûng fur Sozîalîsmûs, Fraûengrûppe Medîco Înternatîonal, Solîfon Zurîch, PYD-Jin, Kaffedonne, Babachîncîn, Labyrînthplaz, Fraûenlora, Wîlp Înternatîonal Womens, Fraûen Bundnîs û bi hezaran jin tevlî festîvalê bûn.

Li qada festîvalê wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Şaylemez û parlementerên girtî yên HDP'ê û pankartên li ser têkoşîna jinan a Rojava hatin daliqandin.

### XWEPARASTIN ŞERT E

Di festîvalê de li ser 'Jin, şîddet û berxwedanê' panelek hate lidarxistin. Parlementera HDP'ê ya Sêrtê Besîme Konca, çalakgera ji Baskê Nekane jî tevlî panelê bûn. Di panelê de bal hate kişandin ku divê jin di her şert û mercan de xwe biparêzin. Jinan desnîşan kirin ku li hemberî şîddeta mêran xweparastina jinan gelekî girîng e.

### TÊKOŞÎNA SAKÎNEYAN LI HER DERÊ DIDOME

Çalakgera ji Baskê Nekane ya ku ji ber daxwaza hikumeta Îspanyayê di girtîgehê de mabû jî di panelê de axivî. Nekane got, "Heke îro jin dikarin werin ba hev, ev bi saya têkoşîna Sakîne Cansiz û rêhevalên wê pêk hatiye. Berdêla wê çi dibe, bila bibe em ê têkoşîna jinan a azadiyê biparêzin."

### DIVÊ EM BIBÊJIN HDP

Parlamentera HDP'ê ya Sêrtê Besîme Konca axivî û bal kişand ser şîddeta ku li Tirkiyê li dijî jinên HDP'yî tê kirin. Konca qala girîngiya hilbijartinên 24'ê Hezîranê jî kir û wiha got; "Ev hilbijartin wê desthilatdariya Erdogan hilweşîne. Li Tirkiyê alternatîfa hêza demokratîk tenê HDP ye. Ger HDP bendê derbas neke wê çûyin û hilweşîna Erdogan û desthilatdariya wî pêk neyê. Ji ber vê sedemê divê di van hilbijartinan de hemû kes piştgiriyê bide HDP û Selaheddîn Demîrtaş."

### DAHATA FESTÎVALÊ JI BO EFRÎNIYAN E

Wê dahata hemû festîvalê ji gelê Efrînê re were şandin ên ku ji ber êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk neçar mane ji Efrînê derkevin û li herêma Şehbayê bi cih bûne. Lîstikvanê berê yê Amed Spor Denîz Nakî jî cilên Amed Spor yê ku îmze dike difiroşe û dixwaze destekê bide Efrîniyan.

Di festîvalê de zarok jî nehatin jibîrkirin. Li qada festîvalê ji bo zarokan cihek taybet hate çêkirin û zarokan jî lîstik û çalakî lidarxistin.

## Di zargotinên kurdî de felsefeyek kûr heye

Prof. Dr. Celîlê Celîl 82 salî ye û emrê xwe bi berhevkirina zargotinên kurdî derbas kiriye û folklorê wekî jiyana xwe pênase dike. Celîl da zanîn ku di zargotinên kurdî de felsefeyeke kûr heye û her zargotinek dersek e û gelek tiştan hînî mirov dike

Li Pale Hunerê ya Amedê ji aliyê weşanên Wardozê bi tevlêbûna Prof. Dr. Celîlê Celîl bi mijara 'Li ser folklora kurdan' panel hat lidarxistin.

Prof. Dr. Celîlê Celîl ji zaroktiya xwe heta niha zargotinên kurdî berhev dike û heta niha têkildarî zargotinan gelek pirtûk çap kirine. Herî dawî weşanên Wardozê pirtûkên Celîl ên bi navê 'Gotinên Pêşiyan', 'Çima Deve Xeyîdî?', 'Zargotina Kurdên Sûriyê' û 'Sêxiştiyên Kurmancî Xorasan' çap kirin.



### MEREQDARÊ FOLKLORA KURDÎ

Celîl diyar kir ku Ji zaroktiyê ve mêyla bavê wî li ser zargotin û stranên kurdî hebû û wî çavê xwe vekiriye timî ji bavê xwe stranên kurdî guhdar kiriye. Celîl da zanîn ku dema di sala 1955'an de li Yerîvanê radyoya kurdî vebû bavê wî berpirsyarê radyoyê bû û dema bavê wî di radyoyê de xebitiye di nav 10 salan de 700 stran berhev kirine û birayê wî Ordîxanê Celîl folklorîstekî profesyonel bû. Celîl wiha behsa çîroka xwe kir: "Ez jî meraqdarê berhevkirina folklora kurdî bûm û diçûm gundan. Çi rastî min dihat min dinivîsand. Pey nediketim lewra diviyabû ez bûbûma dîrokzan. Bendên keçikan, gotinên pêşiyan, paşê bû çîrok, bû destan û hemû tişt."

Celîl da zanîn ku di rêwîtiya xwe ya berhevkirina zargotinan de gava tiştek nû dibhîse, rastî çîrokbêj û dengbêjekî were gelekî kêfxweş dibe û wiha pê de çû: "Ez ferqê danaynim navbera tiştekî mezin û biçûk. Carna gotineke pêşiyan xweşik be, wekî hêjayî 10 çîrokan e. Celîl destnîşan kir ku zargotin wekî ders e, mirov hînî tiştan dike û got: "Dema çîrok û çîvanok taybetiyên xwe hene, hinek hene pir balkêş in û felsefeyeke kûr di wê çîrokê de heye. Carna du rêz gotinberhev dikî û ji wê pirtûkekê çap dikî."

Prof. Celîl anî ziman ku niha di destê wî de gelek qeydên ku nehatine çapkirin hene û wiha got: "Qeydên di destê min de nayên hejmartir û pir in. Bi ku da çûme min hem nivîsandiye û hem jî qeyd kiriye. Dema derdiketim xebatê min ji sedî 4-5 dinivîsand û ji sedî 95 qeyd dikir û dema vedigeriyam deşîfre û çap dikir."


Celîl da zanîn ku ji bo berhevkirina zargotinan beriya her tiştî divê mirov bigere û wiha behsa serpêhatiyeke xwe û xwîşka xwe Cemîle Celîl kir: "Ez diçûm Sûriyê û gelek wesfê wan deran dida. Xwişka min Cemîle xwest were wan deran û min got îcar em bi hev re biçin. Em çûn nav koçeran. Îja hez dikir bi kulfetên malên ên emirmezin re xeber bide. Cemileyê bi jinan re pêwendiyeke dostanî datanî û jinên tu caran bi deng nestriye tiştên wisa ji Cemîleyê re distriyan ku qet nehatine bihîstin. Beriya her tiştî divê mirov zargotinan ji windabûnê xilas bike."

### TEKNOLOJÎ DENGBÊJIYÊ KÊM DIKE

Celîlê Celîl da zanîn ku dengbêjî reng û rûyê kurdîtiyê dide xuyakirin û wiha got: "Îro helbet ji ber hinekî dengbêjî kêm bûye. Teknolojî meş û pêşveçûna dengbêjiyê kêm dike. Berê dengbêjên mîr û axayan hebûn lê dîsa di nav gel de digeriyan. Her roj ji bo axa nedistrandin. Divê dengbêj di fikr û jiyana xwe de azad bin. Wê demê qedrê dengbêjiyê gelekî mezin bûye, dengbêj di dîwanê de li jor rûdinişt. Tu diçî nav eşîra Reşkotan stranên wan gişk mane. Çimkî li cem wana hem dengbêjî xurt bûye û hem jî gelek bûyer hatine serê wan. Mêrxasî jî hebûye, neheqî jî hebû ye, kuştin jî hebûye. Stran heye li ser tiştekî netişt bi dehan mêr hatine kuştin. Dibêjin ji bo postê karekê du eşîran ji hev kuştine. Dijminatî hebû ye, postê kar bûye mene û wekî biteqe. Eşîr hene stran çêkirine û gihandine dewra me, lê gelek eşîr jî hene stranên wan negihiştine me."Celîl destnîşan kir ku kurd bi jiyana xwe bi xwezayê ve girêdayî ne û der barê dengbêjî û xwezayê ev tişt anî ziman: "Salê 5-6 meh em li zozanan dimînin. Li zozanan dema êvaran rûdinên çîrok, stranan dibêjin, şevbihêrkan çêdikin û wisa dema xwe derbas dikin. Li zozanan herkes dengbêj e, deng nexweş be jî bi dilê xwe distrê. Çimkî taybetiyeke sirûştî ye, jixwe tê. Çawa ku tu tî bibî ew jî wisa ye. Gelek dayikên me hene dema kar dikin distrên. Kes ji wan re nabêje bistrên lê ji xwe re distrên û kar dikin. Paleyan stranên rîtmîk pêş ve birine. Mîrkût heye, das heye, kincşûştin heye, hemû ji bo hêsankirina kar e. Gelek cûreyên stranan hene."Celîl da zanîn ku kurdan bi dengbêjiyê tiştên ku hatine serê wan zindî hiştine û wiha axivî: "Dengbêjî û stranvanî gelek tişt gihandine me. Gelek stran li ser serokeşîran bûye. Her dengbêj li ser axayê xwe gotiye. Hinek herêm hebûne şerê navxweyî gelek bûye. Ez çûme Hekariyê wan deran min ew guhdar kirine rengekî dinê ye. Gelek stran li ser mîrekên Hekarî û Bota ye û bi govendkî distrên. Lê li aliyê Serhedê, Mêrdînê û Sûriyeyê wisa nîne, rûniştine û stran gotine. Ev taybetmendiyên jiyandariya wan e."Celîlê Celîl axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Ziman nexşeke dîrokî û destanînek e û divê bê parastin. Zengîniya çand û hunera dinê ye. Divê em biparêzin û ne hewce ye hinek ji me re bibêjin biparêzin.

"…*e-rojname*


## Evdiyê Gozelê



Sîpan ŞÎNDA

Hozan û helbestvanekî xizan û hejar, jiyanek perîşan û belengaz, bûrandina zarokatiyek sêwîtî, şivanî, bêçîvanî, gavanî… Lê di gel van hemiyan mirovek rûken û rûgeş, zilamekî devilken û serbilind. Navê hozanê me Abdûllah Işnaç e. Lê hemî kes wî bi navê Evdiyê Gozelê nasdike. Gozel, navê pîrika wî ya bavê ye. Navê bavê wî Hacî bûye, lêbelê ew hêj kiçik diya wî diçe li ser dilovaniya xwe. Pîrika wî ewî xwedî dike û ew ji bi vî navî tê naskirin. Ew bi xwe ji gundê Biryan yê li ser Sirnexê ye. 8 zarokên wî hene, 5 kur, 3 keç. Her çend çi dibistan ne xwendibe ji, ew kesekî zekî bû. Bes weke gelik kesan mixabin ew ji di nava civakê de weke "keledînekê" dihate bi nav kirin. Ji ber ku ew gelkî henekker û keyfîn bî, di nava civakê de pirr dihate hez kirin ji. Ya rast ger ew bi xwedî bûya yan ji derfetên wî hebîna, ewê bibûya 'komedyenekî' navdar. Ew kesekî gotinên wî di devê wî de bûn. Gelik dizanî gotinan li hev bîne û mirov dikarî bi seetan bê veder û bi kêf guhdarî gotinên wî, tinaz û yariyên wî bike. Kesekî gelik dilovan û nevs biçûk bû. Ji ber wê dilovanî û nevs kiçikiya wî her tim zarok li dora wî kom dibûn û ewî ji wan re henek dikirin, li tembûrê dida, helbest digotin. Ew hozan û helbestvanekî ji nava civakê bû. Helbestên wî gotîn û nivîsandîn, hemî ji li ser jiyana civaka ew di nêvde di jiya bû. Helbestên wî bi awayekî tinazî, li ser pirsgirên civakî bûn. Ewî birînên civakê baş dizanî û her tim ji wî tanîn ziman. Ew hozanekî di nava gel de bû. Ewî her tim helbestên xwe li qehwan, li parqan, li civat û dîwanan, li dawetan, li şîn û şahiyan ji gel re digotin. Civata ku ew lê rûniştiya gotin ya wî bû. Civat her tim bi henegên xwe geş û şa dikir. Carna bi tembûra xwe û pirrê caran ji bê tembûr helbestên xwe digotin. Di helbestên xwe de gelik caran rûspiyên civakê yan ji rêber û serokên dinyayê rexne dikir. Bes bi awayekî henekî û kes pê ne êşe digot. Mînak, li ser Tansû (çiller)-Clinton, Obama, Erdogan û çend rûspiyên Sirnexê gotine. Ne tenê li ser wan her weha li ser halê xwe, feqîriya xwe ji helbest gotine. Me got her çend ewî dibistan ne xwendî bû jî, bes ji ber ku ew mirovekî gelik fêhma ye, hînî zimanê Tirkî bûye û demekî kurt mamostetî ji kiriye. Lê ji ber ewî daniye zarokên gundiyan, gundiyan ji gelik li wî dane û ewî êdî mamostetî nekiriye. Ew di salên 1990 an de çend salan cerdevaniyê ji dike. Lê dema ew cerdevan tê girtin û bi alikarî kirina PKK ê tê tewanbar kirin û 3 sal 6 mehan dikeve zindanê de. Dema cerdevanî dikir rojekê ketiye kemîna gerîlla, lê bi saya serê hozanî û fêhmaya xwe helbestekê li ser bêtêlê ji wan re dibêje û ji kemînê xilas dibe. Ev helbest ji eve:Raste, vê Biryanê wa bi zikake Têde di meşê cehşê pake Jêre bîne cehûrek ka û pape Gundigî, Biryanî, Kirûnî hevre bîne tifaqeMa hûn nizanî ji ber şehîdê Kêlga RizaqeBi rastî min di dixwest ez berfirehî li ser hunera û helbesta wî bisekiniyam, lê mixabin cih nîne. Evdiyê Gozelê hêj ciwan, di 56 saliya xwe de çare ji nexweşiya penceşêrê nekir û di 8/06/2017 an de çû li ser dilovaniya xwe.

## Bîg Reîs



Medeni FERHO

Em ji bedêla "Bîg Brather", "Bîg Reîs" bikar bînin. Bîg Reîs Erdogan e û li Tirkiyê klîmatê derewan afirandiye. Civakek kor, bi magazîna terorê; ol û konsepta nijadperestî nepixandî derxistiye holê. Bi dubarekirinek berdewamî de, rastî, derew têkilî, ragihandin tevlîhev kirine, wek, şantaj, davik û kemînan bi kar tîne. Medya Tirk jî, amûrê herî dijwar yê vê konseptê ye.Ewropa, xwe wek "aqîl"ê cîhanê dibîne, li hemberî "Bîg Reîs" kab berdaye erdê. Erê, lingê wî ji welatên xwe qut kirine, hêdî hêdî rêxistiniya wî ya ceberrud li welatên xwe berteref dikin; lê şantaja wî, wek doqukê himandî ye û Ewropa di tirsê. Di dagirkirina Efrînê de, Ewropa di nava mustehceniya berjewendiyan de, xwelî li serê xwe kir. Bîg Reîs digot, "em ê Efrînê û Idlibê, bikin cihê penaberên Suriye". Lê, endesyariya Erdogan, di zêdekirina sucên mirovahiyê de derkete holê. Efrîn bi çete û malbatên çeteyan dagirt. Erdogan, ji bo çeteyên ku cîhanê ew terorîst qebûl kirine, herêmek ava kir. Ev herêm wê di paşerojan de bibe çavkaniya hîper terorê. Dewelata Tirk, Efrînî bi zorê ji cih û warên wan dane revandin, li gorî peymana bi Rusya, Moskowa û NATO re, çete û malbatên wan li Efrînê bi cih kirin.Niha jî Bîg Reîs, berê xwe daye Başûrê Kurdistanê. Dîse terorê dikê behane. Li Efrînê jî behane teror bû; balkêş e ku navê PKKê, YPG, PYG û DAIŞê bi hev re di dikirand. Cîhana ku, Erdogan wek hevkarê DAIŞê, El Nusra, wek damezrînerê komên çete nas dike, mixabin dengê xwe dernexist. Niha jî Erdogan, dixwaze dagirkirina Başûrê Kurdistanê bi vê gotinê meşrû bike. Bîg Reîs, ji mêj ve Başûr dagirkiriye; tenê Qendîl mabû... Bi êrîşên li dijî Qendîlê jî, dixwaze dagirkirina Başûr meşrû bike. Mixabin, rayedarên Başûr jî, mirîşka birçî ne û xwe di embara genim de dibînin. Bîg Reîs, piştî dagirkirina Efrînê, hilbijartin kire rojevê. Lê, dît ku Efrîn bûye têkçûna wî, berê xwe da Başûrê Kurdistanê. Û cîhan, "Bîg Birather"-Emerîka jî di nav de, li hemberî sucên dewleta Tirk, bi mustehceniya berjewendiyan haraket dikin... Heta îro, şandeyek rêxistinên covakî, ya mafên mirovan neçûye Efrînê, neçûye Şehbayê... Hêzên ku şandeyên lêpirsîn û çavdêriyê şandin Xeza û Habronê, ne şandin Efrînê. Îro jî, leşkerên Tirk û çete, Êzidiyan û welatparêzên Kurd direvînin, dikujin. Cîhan hewqasî apolîtîk û bê alternatîf nabe!..Tirk û Kurd di qonaxek krîtîk de ne. Li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê hilbijartin hene; li Bakur, Rojava û Başûrê Kurdistanê jî şerekî dijwar heye... Di vî şerî de, enformasyonên statîstîkî jî hîper têkçûna Artêşa Tirk nîşan didin. Her roj bi desteyan eskerên Tirk têne kuştin. Bîg Reîs û zewatên li dora wî, barana derewan dibarînin.Hêzên navneteweyî, wek Efrînê, di dagirkirina Başûrê Kurdistanê jî bêdeng in. Serokwezîra Ingilîstanê Teresa May, komkujiyên li Efrîn û li 8 bajarên Kurdistanê ji nedîtî ve hat, piştî hevdîtina bi Erdogan re, "terora Kurdan" şermezar kir. Ev gotin, fenomeniya siyasî û karakterîzekirina dagirkeriya Tirk û mustehceniya berjewendiyên Ewropa ye. Fenomeniya siyasî, ji enformasyonê zêdetir, qirêjî û kirêtiyê enforme dike.Hilbijartinên 24ê Hezîranê parçeyek ji şerê Kurdan li dijî faşîzma Tirkî ye. Şer jî dijwar e û komên faşîst, li gel polîsên kontra her roj derdikevine nêçîra Kurdan. Lewma di gelî, newal û mesîlên dîrokê de hawara gelan olan vedide. Şer, êdî bûye qumara borse û bazara çavkaniyên enerjiyê. Bi tîpên mezin dibêjim; hîber hêzên cîhanê li hemberî komek çeteyên ji çolê, neçar man... Kurdan, ew çete têk birin, îro Kurd dibine qurban. Divê Kurd xwe nekin qurban.

# Trafîk ji bo cejnê tedbîran digire

***Bi nêzîkbûna cejna remezanê re liv û tevgera welatiyan li nava bajarên bakurê Sûriyê zêde buye. Hêzên ewlekariyê jî ji bo ku cejnê tedbîrên xwe zêde dikin. Rêveberiya Navenda Trafîkê ya Tebqa yê ji bo ewlekariya cejnê gelek tedbîran pêş dixe.***



Rêveberiya navenda Trafîkê ya girêdayî Hêzên Ewlehiya Hundrîn a bajarê Tebqayê ji bo pêşwazîkirina Cejna Remezanê gelek plan danîn.

Beşê Trafîkê da ku di rojên cejnê de qelebalixî li bajêr zêde nebe, gelek tedbîr girtin.

Yek ji tedbîrên ku ji aliyê beşê Trafîkê ve bi hevkariya Hêzên Ewlehiya Hundrîn hatin girtin ew e ku hemû riyên sereke yên diçin sûka navendî ya Tebqayê ji erebeyan re hatin girtin û tevgera erebeyan ber bi derveyî bajar û riyên sereke hate derxistin.

Beşê Trafîka erebeyên mezin û motosîkletên ku derbasî sûkê bibin qedexe kir. Ji aliyê din ve jî da ku welatiyan biparêzin gera xwe di nava sûk û kolanan de zêde kirin. Endamên xwe li ser kolanên sereke zêde kir da ku riyeke bi ewle ji welatiyan re peyda bike.

Di vê çarçoveyê de yek ji rêvberên navenda Trafîkê ya Tebqayê Umer Mihemed destnîşan kir ku ji bo ewlehiya welatiyan û da ku qelebalixî di rojên cejnê de li bajar çênebe gelek tedbîr girtin.




Mihemed bang li hemû welatî û ajokaran kir ku li gorî sîstem û pîvanên tirafîkê tevbigerin û bi hevre bibin alîkar da ku tevgera tirafîkê bi awayekî baş derbas bibe…*ANHA*

## Welatiyên gund çarçefên reş davêjin



Şêniyên gundên El-Hilwa bi germahî û sembolên serkeftinê pêşwaziya şervanên Pêngava Bagera Cizîrê kirin û diyar kirin ku ew li benda QSD'ê bûn.

Şervanên QSD'ê di çarçoveya qonaxa temamkirina Pêngava Bagera Cizîrê ya rizgarkirina gundewarên başûrê Hesekê ji çeteyên DAIŞ'ê de gundên Hilwa û Şemas rizgar kirin.

Şêniyên gund diyar kirin ku beriya şervanên QSD'ê derbasî gund bibin wan ji bo piştgiriya QSD'ê alên spî daliqandine.

Welatiyê bi navê Salim El-Elûş diyar kir ku ji beriya çend salan ve ew di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de zehmetiyan dikişînin û anî ziman ku ew bê sebir li bend QSD'ê bûn, bi rizgarkirina gund ew pir kêfxweş in.

Di dawiya axaftina xwe de Salêm El-Elûş wiha got, "Ji beriya 3 salan ve DAIŞ gundê me dagir kiriye, av li ser me qut kiribûn. Di demên dawî de kîna wan a li hemberî me zêde bû, bê suc û sebeb li me didan. Banga Islamê dikin, lê nêzîkatiyên wan ji Islamê dûr in. Niha piştî ku QSD'ê gund rizgar kirin em gelek kêfxweşin."…*ANHA*

## Li Til Hemîsê pirsgirêka avê çareser dibe

Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Kantona Cizîrê diyar kir ku di nava van 15 rojan de dê pirsgirêka qutûna avê li navçeya Til Hemîsê bi dawî bibe.

Li gundên navçeya Til Hemîs a girêdayî Qamişlo, pirsgirêka qutbûna avê tê jiyîn. Sedema qutbûna avê li herêmê ew e ku xetên avê di dema êrîşên çeteyan ên li ser herêmê, xirab bûne.

Têkildarî mijarê û bi armanca çareserkirinê, Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Kantona Cizîrê bi şêniyên navçeyê re civiya. Civîn li navenda Çand û Hunerê ya navçeyê bi amadebûna bi sedan şêniyan hate lidarxistin.



Rêveberê Komîteya Avê ya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Kantona Cizîrê Kawa Ebdo anî ziman ku navçeya Til Hemîsê ji herêmên ku zêde zirar dîtin û pêwîstiya wê bi avê heye. Ebdo bi bîr xist ku di encama êrîşên çeteyên ên li ser herêmê de xetên avê ziyan dîtin û şênî bê av man.

Kawa Ebdo, destnîşan kir ku stasyonên ava vexwarinê û xeta avê dê bi havkariya rêxistinên mirovî ji nû ve werin sererastkirin û got, "Niha me 23 sarîncên avê peyda dikirine da ku ji bo demekê avê li gundan belav bike ta ku xebatên serestkirinê bi dawî bibin. Xebatên sererastkirinê dê di nava 15 rojan de bi dawî bibin."…*ANHA*

## Ji Asayîşê daxuyaniya Cejna Remezanê

Rêveberiya Giştî ya Hêzên Asayîşa Rojava-Bakurê Sûriyê hatina Cejna Remezanê li hemû gelê herêmê pîroz kir û hêvî kir ku cejin bi aramî derbas bibe.

Rêveberiya Asayîşê her wiha bang li welatiyan kir li gorî perspektîfên têne derxistin tevbigirin.

Rêveberiya Asayîşa Rojava-Bakurê Sûriyê ji bo parastina ewlekariyê di cejna Remezanê de daxuyanî da û ji welatiyan xwest ku di xebatên ewlekariyê de alîkariya wan bikin û li gorî pîvan û rêzikan tevbigirin.

Daxuyanî wihaye:

"Ji bo em cejnek di nava ewlekarî û aramiyê de derbas bikin vê Belavokê bi were parve dikin:

1-Tevgera kamyon û sarincan bi hemû cûreyan û mezin bûnên xwe (biçûk navîn mezin) ji roja sêşemê 12.6.2018 an demjimêr 1 piştî nîvê şevê ta demjimêr 3 ber êvarê roja şemiyê di dîroka 16 .6.2018 an.

2-Tevgera motosîkletan bi hemû cûreyên xwe tevlî yên leşkerî , ji dem jimêr 8 sibehê roja çarşemê dîroka 13.6.2018 an ta roja yekşemê demjimêr 3 ber êvarê dîroka 17 .6. 2018.

3- Ji roja 12.06.2018 Sêşemê demjimêr danê sibê 08:00 heya roja 17.06.2018 Yekşemê demjimêr 15:00 danê piştî nîvro derbaskirina seyarên nû di deriyên sînoran de qedexeye.

4- Derveyî pergala ferman biryara ji bo çi sedemê dibe bila bibe ji milê hemwelatiyên leşkerî û sivîl ve bikaranîna çekan qedexeye .

## Firina Til Hemîs hate vekirin

Desteya Şaredariyan a herêma Cizîrê ji ber ku pêwîstiya şêniyan bi nan heye li navçeya Til Hemîs a girêdayî Qamişlo bi firinek vekir.

Desteya Şaredariya a herêma Cizîrê ji bo ku nan ji şêniyên gundewarên Til Hemîs re peyda bike firina bi navê Til Hemîs vekir. Vekirina firinê bi merasîmekê pêk hat.

Hevserokê Desteya Şaredariyan a herêma Cizîrê Josef Lehdo axivî û got, "Komên çekdar hemû saziyên sivîl, xizmetguzarî, toreyên avê, kanalîzasiyonê, ceyran û dan û standinê rûxandin."

Lehdo di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku Rêveberiya Sivîl hemû tiştên ku çeteyan hilweşandiye ji nûve ava dike û got, "Vekirina firinê yek ji mînaka vê ye. Girînge ku xebatkarên firinê bi awayekî baş kar û xebatên xwe bimeşînin."

Bi navê Hevserokatiya Meclîsa navçeya Til Hemîs Salih El-Xelef, bi navê Şaredariya Gel a navçeya Til Hemîs Abdulrehman El-Hadî, bi navê Eşîra El-Tefhîyîn Silêman El-Başa û bi navê Hevserokatiya Meclîsa Malbatên Şehîdan a navçeyê Ehmed El-Ebawî axivîn.

Di axaftinan de hate gotin ku Rêveberiya Sivîl alîkariya şêniyên herêmê dike û pêwîste şêniyên herêmê jî parastina deskeftiyan bikin.

Paşê deriyê firnê ji aliyê dayîka şehîd Ehmed El-Ebûş ve hate xwendin…*ANHA*





# Li Meclîsê em ê bibin dengên gelan

***Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan, di mîtînga Çewlîgê de ji hezaran re axivî û diyar kir ku HDP wê li meclîsê bibe dengên hemû gelan. Bûldan wiha got, "AKP û MHP bûn tifaq û xwestin Kurdan di bin bendê de bihêlin. Lê wê bi ser nekevin. Em ê li meclîsê bibin nûnerê gelan û van polîtîkayan pûç bikin."***




Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan, di mîtînga Çewlîgê de axivî û bal kişand ser îtifaqa AKP-MHP'ê. Bûldan got; "Armanca wan bi dengê Kurdan guran bixin Meclîsê. Hişmendiya got 'Kevir li ser kevir û serî li ser mil nehêlin' li dijî kurdan bûn tifaq.

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan, di çarçoveya xebatên hilbijartina 24'ê Hezîranê de tevlî mîtînga HDP'ê ya bû.

### HER KESÎ JI AKPÊ ZILM DÎT

Pervîn Bûldan, ji hezaran kesîre axivî û anî ziman ku ev welat ne mahkûmê AKP û Tayyip Erdogan e û wiha axivî: "Ev welat ne muhtacê AKP'ê û Erdogan e. AKP 16 sal in li ser îktîdarê ye. Hemû kes rastî zilma wan hatin. Gelê vî welatî kirin mahkûmê xizanî û zilmê. Her tiştî ji bêrîka we didizin. Divê hûn yek dengî jî nedin AKP'ê. Bêrû ne wê dîsa bên dengan ji we bixwazin. Keyayan kom dikin. Gefan dixwin. Lê êdî gel biryara xwe daye. Erdogan êdî rêwî ye. Wekî din çare tune ye."

Bûldan, destnîşan kir ku Kurd ol û bawerî ji AKP'ê û Erdogan fêr nebûne û got: "Em ol ji wan fêr nebûne. Bila olê nîşanî me nedin. Em ji destpêkê de bi ola xwe ve girêdayî ne. Gelê Kurd û gelên din ên rastî zilmê hatine ji niha ve biryara xwe dane. Ev pirsgirêk bi şer û ewlehiyê çareser nabe. Pirsgirêka ziman, ol, çand û nasnameyê heye. Êdî hêza tu kesî tune ku nasname, ziman û çanda me înkar bike. Gelê Çewligê wê kesên li dijî kurdan ceza bike. AKP bi MHP'ê re tifaq ava kir. Dixwazin bi dengê Kurdan gur bibe meclîsê. AKP û MHP bûn tifaq û xwestin Kurdan di bin bendê de bihêlin. Lê wê bi ser nekevin. Em ê li meclîsê bibin nûnerê gelan. Em ê bibin meclîsa gelan û van polîtîkayan pûç bikin."

## Li Şengalê perwerdeya jinên mamoste

Perwerdeya birdozî ya 15 rojan li Akademiya Şehîd Binevş a Şengalê dihat dayin bi dawî bû. Di perwerdeya birdoziyê de deh mamoste hatin perwerdekirin. Her wiha bi munasebeta bidawîbûyina perwerdeya birdozî şahiyek hat lidarxistin.

Perwerdeya birdozî ya 15 rojan li Akademiya Şehîd Binevş a Şengalê dihat dayin bi dawî bû. Endama Tevgera Azadiya Jinên Êzidî Ferîda Şengalî û mamosteyên ku beşdarî perwerdeyê bûn, dan zanîn ku perwerdeya birdozî ji bo pêşketina jinê û civakê gelek girîng e, divê perwerde her dem bê dîtin.

Ferîda Şengalî bal kişand ser tevgera têkoşîna jiyanek azad û got: "Em gelek kêfweş in ku jinên Êzidî beşdarî perwerdeyê dibin û xwe pêş dixin. Perwerde wekî av û nan girîng e divê em ji bo her qada jiyanê perwerdeyê bibînin û girîngiyê bidin perwerdeyê. Em ê li ser esasên fikir û ramanên Rêber Apo perwerdeyên xwe berdewam bikin."

### DIVÊ PERWERDE TÎMÎ HEBE

Mamoste Sebîha Sebrî ya ku cihê xwe di rêveberiya mamosteyan digire derbarê perwerdeyê de wiha got: "Ev 15 roj in me perwerde dît. Ev perwerde ji bo me gelek girîng bû. Me di perwerdeyê de dît ku ka em ê di civakê de çawa nêzî zarokan bibin û wan perwerde bikin. Girîngiya mamosteyan a di civakê de çi ye, em li ser van esasan sekinî û me gelek feyz ji vê perwerdeyê girt. Ji ber ku di nava civakê de rola mamosteyan gelek girîng e divê mamoste jî her dem bên perwerdekirin."



### PERWERDE JIYANÊ AZAD DIKE

Mamoste Nesrîn Sedo jî wiha got: " Min jî wekî mamosteyekê di vê perwerdeyê de cihê xwe girt û gelek min feyz ji vê perwerdeyê girt. Di perwerdeyên bi vî rengî de mirov xwe û dîroka xwe nas dikin. Ji ber ku di perwerdeyê de mirov xwe pêş dixin, civak jî bi vî awayî pêş dikeve. Perwerde jiyanê azad û aram dike loma divê em wekî jin girîngiyê bidin perwerdeyê û beşdarî perwerdeyê bibin. Banga min ji hemû jinan ew e ku bê perwerde nemînin."

### MAMOSTE HÊVIYA CIVAKÊ NE

Mamoste Cîhan Elî jî diyar kir ku mamoste hêviya civakê ne û got: "Dema ku ez beşdarî perwerdeyê bûm ez gelek bi kelecan bûm. Piştî perwerdeyê min girîngiya perwerdeyê bêtir fam kir. Ez gelek tişt hîn bûm. Niha nêzikatiya min a li dijî zarok û civakê bêtir guhert. Loma divê em hemû jin bên perwerdekirin ji ber ku jin awêneya civakê ye."… *NûpeldaTêkoşîn/ OrîvanEbdo*

## Jin berê xwe didin Pêşengeha Devoşka

Pêşengeha Devoşka ya ku ji bo welatî kincên hîn erzantir bikaribin bi dest bixin hatiye vekirin rengekî cûda da yê bajêr e. Rêvebera Pêşengehê diyar kir ku Pêşengeha Devoşka di sûkê de xwedî wate û cihekî cûda ye.

Yekîtiya Mamosteyan li Bajarê Til Temir bi alîkariya Mala Koompratîfan pêşengeha Devoşka vekir. Di pêşengehê de cilên zarok û jinan tên firotin. Ev pêşengeh di warê buhabûna kincan de bi erzaniya xwe ji gel re dibe alîkar.

Rêvebera Pêşengeha Devoşka Cîhan Yûnis diyar kir ku Mamoste di avakirina van koompratîfan de rola xwe baş dilîzin û got: ''Armanca me wekî mamoste di avakirina vê koompratîvê ew e ku bikaribin bi gelê xwe re bibin alîkar. Rola pêşengeha Devoşka di Sûkê de pir cûda ye. Ji ber ku hemû pêşengeh amûran bi pereyên pir zêde difroşin gel. Lê pêşengeha me rewşa gel li ber çavan digire û bi pereyên kêm kincan difiroşe.''

Cîhan di berdewamiya axafitna xwe de anî ziman ku erka mamosteyan ne tenê perwerdekirina zarokan e û divê ku civakê jî heşiyar bikin û wiha dewam kir: ''Mamosteyên me ji mamosteyên Rêjîmê pir cûda ne ji ber mamosteyên me hem zarokan perwerde dikin û hem jî civakê pêşdixin, hişyar dikin. Avakirina kooperatîfên bi vî rengî aboriya gel û mamosteyan jî hîn xurtir dike.''

Cîhan bang li hemû jinan kir ku cihê xwe di qadên aborî de bigrin û gotina ku jin nikarin tiştekî bikin vala derxînin.

Hediya Hemîd ku ji bo pêwîstiyên zarokên xwe hatiye pêşengeha Devoşka wiha got: ''Ez pir kêfxweşim bi vekirina vê pêşengehê. Ji ber ku bi rastî rengekî cûda dide sûka bajêr. Hin kinc û tiştên din kêm in lê di demên pêş de ez bi hêvî me ku bên temamkirin. Ez bang li her kesî dikim ku werin pêşengeha Devoşka bibînin û ez bawer im dê poşman nebin.''

Hêjayî gotinê ye ku pêşengeha Devoşka beriya hefteyekê li Til Temirê nû hat vekirin…*JINNEWS*




## Asayîşa Jin tekezkirina ji rêvbirina azad e





**Melek DEMÎRTAŞ**

Hêzên Asayîşa jin di qadên meydanî û parastina ewlehiya hindiriîn a herêmê de rolek girîn lîstin. Ku ji hişmendiya desthildar û paşvero re teslîm nebûn û li himberî çeteyên DAIŞ'ê di çeperên herî pêş de şerkirin, di encamê serkeftinên mezin bi dest xistin.

Ku bi jin di qadan de şer dimeşand, him yê çekî û himjî yê hişmendî dikir û bi lehengî karîbûn ew qalib, doxmatîzmeya bişkînin.

Li ser rol û girîngiya beşdarbûna jin di nav hêzên asayîşê de jinan ji riojnameya ronahî re nerînên xwe anînziman û got: " Jin bi berdêlên giran parastina xaka xwe kir û di qonaxa şoreşê de ji bi nasnameya xwe yî azad û rêixstinkirin derkete ser dike û dîroka jin bi pênûs û nasnameya jin jinûve hate nivîsandin."

### JİN RÊXİSTİN Û TEVLÎBÛN SÎNORDARA NAKİN

Endma Asayîşa jin Heyfa Ebdo diyar kir ku tevlîbûn û pêşketina jinên Rojava û Bakurê Sûriyê jî xwe di herêmên xwe de sînordar nekirin û wiha got:"Her hewldan ku xwe bighînin hemû jinên cîhan û pêkhateyan. JI ber ku pirsgirêka jinên cîhanê mîna pirsgirêka xwe dibînin, JI bo wê her hewldanên ku civakê de asta hişmendiyê, têgihiştî, çandî û rizgarkirin. Ji bo wê di avakirin û rêvebrina civakê de jin xwedî rolek serekeye, ev hemû jî di encamê analîz û felsefeya Rêbertî ye ku dibêje "Heya jin azad nebe civakazad nebe".


### PARSTİN ERKEKÎ GİŞTÎ YE

Heyfa Ebdo da zanîn ku bi hizkirin û girêdna bi xak û rêhevaltî heya niah em tekoşîna xwe ya di nav hêzên asayîşê de dewam dike û Heyfa bi dawî kir: "Rol û girîngiya jin di asayîşê girînge, ji ber berî her tiştî pêwîste di milê leşkerî û civakî de jî mirov xwedî tyabetmendiyên welatparêzî, rêvebirina azad û xwe rêxistin kirin be, da ku di hemû qadna de çalak be. Her wiha di parastin û ewlehiyê de tenê dimilê mêr de sînorda nîne, ji ber ku ev dozek giştî û civakî ye jî. Avakirina civakek exlaqî û polîtîk û azadiya zayendî encex bi tevlî bûn û çalakirina jin çêbibe."

### HER DÛ CİNS HEV TEMAM DİKİN

Salîha Mihemed jî got: "Di hemû qadên jiyanê û taybet leşkerî de herdû cins jin û mêr di hev temem dikin. Çi di bendê kontrol û çeperan de jî mil minl xebat didin meşandin û tekoşnîê dekin. Ji ber ez di riya xebatê xwe de yê di nav hêzên asayîşê de, ketim wê ferqê ku ji bo parastin û pêşxistina civaka xwe xwedî wê hêzême û dikarim bikim."

Salîha Mihemed wiha bi dawî kir: "Ji bo aramî û azadiya jin emê her asta tekoşîna xwe xurtir bikin û xeta şahîdên xwe biparêzin, da ku em layîqî van berdelên giran û biha bin."



## Hilbijartina bi gopal

Qasim ENGÎN

Di 24 hezîranê de li Tirkiye û Bakûrê Kurdistanê hilbijartinên pêşwext ango hilbijartinên serdegirtî yê werin lidarxistin. Niha de li seranserê Tirkiye û Kurdistanê erîş li hember hêzên muxalefetê heye. Niha de serdegirtina li ser mal-buro-mîtîng, xebatkar û alîgirên wan tên pêşxistin. Hewldidin, girseyên li dijî hêza desthilatdar bê tapisandin. Bi gotinek din, beriya ku hilbijartin destpêbikin, dixwazin yên ku cuda di fikrin teslîm bigirin.
Di dîroka Tirkiye ya faşîzan de hilbijartinên wiha hebûn. Taybet di salên 1912 de, dema hêza faşîst ya Tevgera Îttîhatî Terakkî de, hilbijartin bi tune kirin, bi tepisandin, bi kuştin, bi dîlgirtina muxalefetê hatibû derxistin û TÎT bi hijmarek gelek mezin, qaşo serketî bû. Lê encamê serketina bi Darê Zorê ango Bi Gopal çi ji xwere anî, îro herkes dizane. TÎT di eslê xwe de hêzek netewperest, nijadperest bû. Lê bi hostayiyeke gelek mezin dikaribû xwe demokrat heta xwe wek rexistineke gelan nîşan bide. Gotinên wek ji herkesî re: Wekhevî, azadî û biratî dirûşma wan bû. Ev gotin ewqasî bi bandor bûn ku, di nava TÎT de; Kurd, Ermen, Arnavut, Rum, Ereb, Tirk, Cihû û her wiha gelek rengên dîtir cihê xwe digirtin. Heta di nav avakerên wan de du Kurd jî hebûn.
Lê hê piştî hilbijartinên Bi Darê Zorê çend roj derbas nebûn erîş û tapisandina muxalîfan destpêkir, pê re jî, qirkirina Ermenan, Suryan-Keldanan û Kurdan pêkanîbûn. Ew qirkirin ewqasî bi hovbûn ku, pê re ji bo tevahî hêzên faşîzan yên cîhanê bûbûn mînak. Mînak, Hîtler komkujî û qirkirina Cihûyan spartî bû li ser qirkirinên TÎT. TÎT hêzek faşîst, netewperest û nîjadperest bû. Lê xwe wek demokrat û dostên gelan nîşandabû. Heta bi salan jî wiha kar kirîbû. Hema em bêjin AKP û Erdogan jî bi tevde him fikir û ramanên TÎT temsîl dike û him jî tevahî rê û rêbazên wan ji xwere mînak digire û him jî pêk tîne.
Di destpêkê de Erdogan û AKP qaşo ji herkesî re dost û bira bûn lê niha derket holê ku çendî netewperest, nîjadperest in. Û çendî bi partiya MHP a faşîst re c]wiyê ruhî ne. Çendî yek in, îro li heman demê baştirîn fêm dibe. Mixabin di dema TÎT de gelek gel, rewşenbîr, şoreşger hatibûn xapandin û bibûn şîrîkê faşîstan.
Lê encam gelek bi êş bû. Heman tişt di dema Erdogan-AKP de jî rû da. Sedan rewşenbîr, lîberal, Kurd, Ereb, Elewî, Romen, Jin, hunermend piştgirî dan Îttîhatgerên hemdem, lê îro hemû di hedefa Erdoganê faşîst de ne.
Mixabin hê jî hinek bask ku-niyeta wan çi dibe bila bibe-dibin amûrê wan leyistikên qirêj û faşîzan.
Em ji bîra nekin ku; birêz Molla Mustafa di zindana Tirkan de ji dayîk bûbû. Dîsa birayê wî yê mezin Abdulselam Barzanî bi destê Îttîhatgeran hatibû dervekirin. Her wiha yên ku Şêx Ehmed û Molla Mustefa radestî rejîma Iraqê kirîbûn Tirk bûn. Û em ji bîr nekin ku yên nehiştin çi Abdulkerîm Qasem çi jî Saddam hevdîtînên dema xwe de bi Molla Mustefa re bibe dawî carek dîsa Tirk bûn. Û her wiha yên ku Referanduma Başûr ji xwe re kirin hêncet û êrîş anîn ser Kerkûk û giştî Kurdistan jî carek din Tirkên netewperest bûn. Him jî Tirkên Îttîhatger. Ango tirkên wek Erdogan-Bahçelî faşîst. Bi hêviya ku îcar tevahî Kurd li dijî hilbijartinên Darê Zorê xwe di 24 hezîranê de bikin yek…

# Hewl didin dagirkeriyê rewa bikin

***Komîteya Têkiliyên Derve ya Koma Civakên Kurdistanê KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand diyar kir ku daxuyaniya endamê polîtburo ya PDK'ê Sefîn Dizeyî, hewldanek rewakirina êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê ye. Komîteyê got, "Yên ku bi salan e dibêjin 'Bila PKK ji Şengalê ji Başûr derkeve', rojekê bi tenê jî ji bo dewleta Tirk ne gotine ji Başûrê Kurdistanê derkeve."***



Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê destnîşan kir ku daxuyaniya endamê polîtburo ya PDK'ê Sefîn Dizeyî, hewldanek ji bo êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê ye.
Komîteya Têkiliyên Derve ya Koma Civakên Kurdistanê KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, "Têkoşîna gelê Kurdistanê ya li çar parçeyên Kurdistanê bi hev ve girêdayî ye û hev xwedî dike. Ev têkoşîn sedema hebûnê ya hemû rêxistinan e û hebûna hemûyan qewîn dike."
Komîteyê diyar kir ku li Rojhilata Navîn hêzên global û herêmî şerekî giran ê hegemonyayê, gel jî têkoşîneke mezin a azadiyê dikin.
Komîteyê destnîşan kir ku dewleta Tirk û tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê, ji bo Kurd di vê têkoşînê de nebin xwedî maf, azadî û statuyê bi hemû hêza xwe êrîşî gelê Kurd dikin û wiha dewam kir: "Êrîşên qirkirinê yên beriya niha li Cizîr, Nisêbîn, Sûr, Şirnex û piştre li Efrînê hatin kirin, ji bo vê armancê bûn. Tifaqa AKP-MHP'ê niha jî ji bo vê armancê dest bi êrîşên dagirkirina Başûrê Kurdistanê kiriye. Tifaqa AKP-MHP'ê îdîa dike ku 'armanca van êrîşan Kurd nînin, PKK ye'. Lê belê ev îdîa ji bilî demagojiyek qirêj a mêtingeran nayê ti wateyê. Ji xwe PKK tevgereke ku ji ewladên gelê Kurd ên ji çar parçeyan pêk tê. Gelê Kurd jî bi PKK'ê û saziyên xwe yên siyasî û civakî yên li her parçeyî bûye xwedî îrade. Lewma li kîjan parçeyî dibe bila bibe, êrîş li kîjan tevgereke ku îradeya azadiyê ya Kurdan temsîl dike bê kirin, ew êrîş li dijî gelê Kurd bi xwe ye. Ti demagojiya mêtinger nikare vê rastiyê binixumîne."

### HELWESTA HIKUMETA BAŞÛR ZELAL NÎNE

Gelê me, partiyên siyasî, rêxistinên civakî yên sivîl û saziyên civakî yên li Başûrê Kurdistanê hay ji vê rastiyê hene û bi vê bîr û baweriyê li ber dagirkeriya TC radibin. Piraniya partiyên siyasî bi daxuyaniyên xwe, rêxistinên civakî yên sivîl û gelê me jî bi çalakiyên xwe helwesta xwe nîşan didin.
Lê belê ya ku diviyabû beriya her kesî helwesta herî tund nîşan bida hikûmeta Başûrê Kurdistanê ye. Lê hikumet helwesteke zelal nîşan nade û bi hin daxuyaniyên ku li ser navê wê hatine dayin, êrîşan û dagirkeriyê rewa dike. Daxuyaniya bi navê hikumetê ji aliyê endamê polîtburo yê PDK'ê Sefîn Dizeyî ve hatiye dayin, cihê fikar û gumanan e. Sefîn Dizeyî dibêje, 'Dewleta TC ji ber PKK'ê êrîşî Başûrê Kurdistanê dike, lewma divê PKK ji Başûrê Kurdistanê derkeve'. Ev daxuyanî hewldana ku dixwaze êrîşên dagirkeriyê yên li dijî Başûrê Kurdistanê rewa bike, mîna tiştekî baş e nîşanî bide û di vê mijarê de têkiliyên xwe yên bi TC re veşêre. Bi vê armancê, qenala televîzyonê CNN Turk a ku şer sor dike anîn Başûrê Kurdistanê, ji bo propaganda şerê taybet kir ku malzemeyan ji xwe re kom bike û li gundê Bermizê jî sifre ji dagirkeran re raxistin. Yên ku bi salan e dibêjin 'Bila PKK ji Şengalê derkevin, bila PKK ji Başûr derkeve', rojekê bi tenê jî ji bo TC ne gotine dagirker e, negotine bila tavilê ji Başûrê Kurdistanê derkeve. Ev yek rewşeke manîdar e. Ev nêzîkatiya ku di şexsê Sefîn Dizeyî de şênber bûye, hem ji aliyê zîhnî, hem jî ji aliyê siyasî ve heqaretek e li her çar parçeyên Kurdistanê, heqaretek e li nirx û dîroka têkoşînê ya Kurdan e. Di vê êrîşê de, ji zerara ku ji ber êrîşê rû didin dijmin berpirsyar nîşan nadin. Radibin gel û rêxistina ku li dijî êrîşan li ber xwe didin berpirsyar nîşan didin. Li gorî vê zîhniyetê, eger gelê Başûrê Kurdistanê ji bo maf û azadiya xwe li ber xwe nedabûya, ne Enfal dihate kirin, ne komkujiya Helebçeyê dihate kirin. Lê belê, xwediyê vê zîhniyetê divê zanibin; eger di dema Enfalê, dema Helebçeyê û dema Raperînê de gelê Kurdistanê li ber xwe nedabûya û berdêl nedabûya, ew bi xwe jî niha tine bûn.

### GELÊ BAŞÛR HELWESTA XWE NÎŞAN DA

Pêwîste her kes zanibe, têkoşîna gelê Kurdistanê ya li her çar parçeyan bi hev ve girêdayî ye û hev xwedî dike. Ev têkoşîn hem sedema hebûnê ya hemû rêxistinan e, hem jî hebûna hemûyan qewîn dike. Eşkere ye ku koalîsyona AKP-MHP'ê ya faşîst dijminê hemû rêxistinên Kurdan û gelê Kurd e. Gelê me û partiyên siyasî yên li Başûrê Kurdistanê ev rastî herî baş di pêvajoya 'referandûmê' ya Başûrê Kurdistanê de dîtin.
Ji ber vê yekê, em bang li hikumeta Başûrê Kurdistanê û PDK'ê dikin ku li ser bingeha vê rastiyê helwestê li dijî mêtingerî û dagirkeriyê nîşan bide. Gelê me li bendê ye ku ev helwest li dijî dagirkeriyê be, li aliyê berxwedanê be.
Bêguman gelek partiyên siyasî, saziyên civaka sivîl, saziyên jin û ciwanan ên îradeya gelê me yê Başûrê Kurdistanê tesmîl dikin û gelê me bi xwe, li dijî dagirkeriyê helwest nîşan dan. Ev helwest ji bo me gelekî hêja ye. Lê belê qonaxa heyî nîşan dide ku ji nîşandana helwestê wêdetir pêwîstî bi çalakiyan heye. Lewma em bang li hemû hêzên siyasî û civakî dikin ku helwesta xwe tund bikin û çalakiyên xwe geş bikin. Em ê tevî gelê xwe û dostên xwe li dijî êrîşên dagirkeriyê berxwedana xwe geş bikin û li ser vê bingehê gelê xwe silav dikin."

## Li dijî êrîşan Yekîtî pêwîste

Mihemed Hebîb destnîşan kir ku divê gelê Kurd di vê pêvajoyê de li hemberî êrîşên dewleta Tirk bibe yek.
Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê-Rêxistina Kobanê Mihemed Hebîb êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Kurdistanê nirxand.
Hebîb got: ″Dewleta Tirk ji zûde destkeftiyên gelê Kurd û hebûna wan qebûl nake. Qendîl xaka Başûrê Kurdistanê ye û niha Tirkiye tehdîd dike ku êrîşî Qendîlê bike.″
Hebîb diyar kir ku mafê dewleta Tirk tune ye ku êrîşî başûrê Kurdistanê bike, ew bi vê yekê dixwaze îradeya gelê Kurd bişkîne.
Hebîb diyar kir ku gelê Kurd li hemberî van êrîşan divê yekîtiya xwe çêbikin û Kurdên ku pişta xwe didin Tirkiyê divê werin ser hişê xwe û ji bo yekîtiya netewî bixebitin.
Hebîb wiha dewam kir: ″Em weke partî dibînin ku eger em weke gelê Kurd lihev bikin û bi doza xwe bawer bin, em ti carî têk naçin û em ê bikarbin li hemberî dewleta Tirk derbikevin, eger yekîtiya gelê Kurd çênebe ew nikare biserbikeve″.
Hebîb hedefa Erdogan ji êrîşa li ser Başûr û Rojavayê Kurdistanê wiha nirxand:″ Erdogan di pêvajoya hilbijartinan de van tehdîdan dike û ji bo zêde deng bigre êrîşî Başûr û Rojavayê Kurdistanê dike. Divê gelên Tirkiyê bi vê yekê neyê xapandin. Erdogan di bin navê şerê li hemberî PKK`ê Efrîn dagirkir û bû sedema kuştin û koçberkirina bi hezaran ji şêniyên Efrînê."



Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê-Rêxistina Kobanê Mihemed Hebîb di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Dewleta Tirk îrade û hebûna gelê Kurd qebûl nake. Li her devere Kurd lê hene Tirkiye êrîşî wan dike û bi taybet di êrîşa li hemberî Qendîlê dixwazin îradeya gelê Kurd bişkîne. Divê Kurd ji her demê zêdetir yekîtiya xwe ava bikin."…*ANHA*

## YNK wê piştgiriya hemû Kurdistanê bike

Cîgirê Sekreterê Encumena Navendî ya YNK'ê Zubêr Osman diyar kir ku YNK piştgiriya xebata rewa ya aştiyane û demokratîk a parçeyên din ên Kurdistanê dike û diyar kir ku helwesta YNK'ê nehatiye guhertin.
Şandeya Rojavayê Kurdistanê ya ji Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan, Endamê Têkiliyên Doplomasî yê TEV-DEM'ê Kamîran Mehdî, Hevserokê Nûnertiya Rojava ya Başûrê Kurdistanê Cawîdan Hesen û Nûnerê PYD'ê yê Başûrê Kurdistanê Selman Ereb pêk dihat serdana sekreterî û hejmarek endamên Encumena Navendî ya Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê YNK'ê kir.
Cîgirê Sekreterê Encumena Navendî ya YNK'ê Zubêr Osman, ji ber beşdarbûna li merasîm û taziya Serokê Encumena Navendî ya YNK'ê Adil Mûrad û taziya ji bo li Rojavayê Kurdistanê hatî danîn spasiya şandeya Rojavayê Kurdistanê kir. Herwiha hevkartiya di navbera YNK'ê Rojavayê Kurdistanê û PYD'ê de dubare kir.
Cîgirê Sekreterê Encumena Navendî ya YNK'ê Zubêr Osman



diyar kir ku YNK piştgiriya xebata rewa ya aştiyane û demokratîk ên parçeyên din ên Kurdistanê dike û bi taybet Rojavayê Kurdistanê.
Osman diyar kir ku wê ev helwesta YNK'ê berdewam bike.
Cîgirê Sekreterê Encumena Navendî ya YNK'ê Zubêr Osman li hemberî dagerikeriya dewleta Tirk bi fikarên xwe anî ziman.
Serokê Meclîsa Rêveber a Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan jî wiha got; "Hevkarî û alîkariya YNK'ê ya ji bo Rojavayê Kurdistanê ji aliyê hizb, aliyên siyasî û xelkê ve cîhê şanaziyê ye. Hêvîdarim ku çawa di şerê li dijî DAIŞ'ê de YNK bi roleke girîng rabû, di piştgiriya şoreş û berxwedana Rojavayê Kurdistanê de, di vê qonaxa xebatên siyasî û destpêkirina danûstandina de jî YNK rêbaza Celal Talebanî berdewam bike."



# Êrîş ne li dijî PKK'ê, li dijî gelê Kurd e

***Çavdêrê siyasî Mehemed Emîn Pencewînî têkildarî hewldanên dewleta Tirk ya dagirkirina başûr axivî û diyar kir ku pêwîste Parlamentoya Herêma Kurdistanê û hemû aliyên siyasî yên kurd bibin yek, helwest nîşan bidin. Pêncewînîn got, "êrîşên Tirkiyê ne tenê li dijî PKK'ê ne, li dijî doza rewa ya Kurd e."***



Mehemed Emîn Pencewînî diyar kir ku armanca dewleta Tirk dagirkirina Kurdistanê ye û dema dagir kir bi hêsanî jê dernakeve, lewma pêwîste Parlamentoya Herêma Kurdistanê û hemû aliyên siyasî yên kurd bibin yek, helwest nîşan bidin.
Çavdêrê siyasî Mehemed Emîn Pencewînî têkildarî hewldanên dagirkeriyê ku Tirkiye li hemberî Başûrê Kurdistanê dimeşîne, axivî.
Mehemed Emîn Pencewînî bibîr xist ku dîrokek kevin a dagirkeriya Tirkiyê li Başûrê Kurdistanê heye û got: "Zêdetirî 15 baregehên leşkerî yên Tirkiyê li Başûrê Kurdistanê hene. Ev du sal e jî hêza xwe û saziyên xwe yên sîxurî di nava herêmê de zêde dike. Armanc jê ew e ku li Herêma Kurdistanê bicîh bibe û bi hêsanî jî dernakeve."

### ARMANC TEVAHIYA KURDISTANÊ YE

PÊncewînî da zanîn ku dîmenên leşkerên Tirk ku li gundên Başûr hatine kişandin û belavkirin, peyamekê didin û Tirkiye dixwaze bêje, "Me ev welat dagir kiriye û kesek nikare rêya me bigire."

### DIVÊ HELWESTÊ NÎŞAN BIDIN

Emîn PÊncewînî destnîşan kir ku êrîşên Tirkiyê ne tenê li dijî PKK'ê ne, li dijî doza rewa ya Kurd e, lewma divê hemû aliyên siyasî helwest nîşan bidin û wiha dewam kir: "Divê li hemberî dagirkeriyê Parlamentoya Herêma Kurdistanê bicive û helwesta xwe nîşan bide. Herwiha pêwîste helwesta hemû hêzên siyasî ên Kurdistanê hebe."
Pencewînî, hêvî kir ku hewldanên dagirkeriyê yên Tirk hêzên siyasî yên Başûr di heman eniyê de bighijin hev û got: "Mixabin li Başûrê Kurdistanê di nava aliyên siyasî de ne wekheviyek mezin heye. Bila ev dagirkerî bibe derfetek ji bo yekîtiya nava aliyên siyasî û bi hevre daxwazê ji hêzên navnetewî bikin ku Tirkiye ji xaka Herêma Kurdistan bê derxistin, dawî li dagirkeriyê bê anîn."…*ROJNEWS*

## Komkujiya Enqereyê karê AKP'ê ye

Li gorî malpera Ahval, servîsa veşartî ya Yekîtiya Ewropayê EUINTCEN raporeke 'veşartî' amade kir û tê de destnîşan kir ku berpirsyarê Komkujiya Enqereyê ya 10'ê Cotmeha 2015'an desthilatdariya AKP ye.
Ahvalê ragihand, rapora ku heta 13'ê Cotmeha 2015'an ji aliyê EUINTCEN'ê ve hate amadekirin û heta niha veşartî bû, bi dest xistiye. Li gorî malperê, EUINTCEN'ê rapora xwe çend roj piştî komkujiya Enqereyê ku 103 kes miribûn, ji mekanîzmayên biryardanê yên herî bilind ên Yekîtiya Ewropayê (YE) re şandiye.
Di rapora îstîxbaratê de ku hate gotin 'gelekî veşartî ye', balê dikişîne têkiliya navbera Komkujiya Pirsûsê ku 20'ê Tîrmeha 2015'an hate kirin û 33 kes mirin û Komkujiya Enqereyê. Li gorî Ahvalê, EUINTCEN qala 'dewamiya' navbera herdu komkujiyan dike û vê tespîtê dike:
"Di hedefa êrîşkarên bombeyî de yên li Enqereyê ESP jî hebû. Yek ji damezrînerên ESP'ê, Hevseroka Giştî ya HDP'ê Fîgen Yuksekdag e. Êrîşa li Enqereyê di demeke welê de hate kirin ku ji bo hilbijartinên dubarekirî yên 1'ê Mijdarê kampanyayeke berfireh a hilbijartinê dihate kirin û operasyonên leşkerî yên hikumetê yên li dijî PKK'ê bi dijwarî dewam dikir."
"Êrîşên li Pirsûs û Enqereyê dişibin hev. Di herdu êrîşên bombeyî de tedbîrên ewlekariyê yên polîsan kêm bûn an jî qet nebûn. Di herdu mîtîngan de jî ESP hebû. Herdu mîtîng li ser Kurdan bûn. Di êrîşên Pirsûs û Enqereyê de gumanbar DAÎŞ bû..."
"Berpirsyariya êrîşa bombeyî ya li mîtînga aktîvîstên aştiyê yên Kurd ên li Enqereyê, eşkere ye ku wê di stuyê terorîstên DAÎŞ'ê de bimîne ku demeke dirêj li ser sînorê Tirkiye, Sûriye û Iraqê tevdigeriya. Ji ber ku hilbijartinên giştî yên 1'ê Mijdarê nêz e, hêzên li nava mûxalefetê yên destekê didin polîtîkayên tund ên hikumetê yên bi serkêşiya Serokkomar Recep



Tayyîp Erdogan, dibe ku tevlî êrîşê bûbin."
EUINTCEN encama ku bi dest xist, wiha eşkere kir:
"Şêwe û rêbaza êrîşê (bikaranîna êrîşkarê bombeyî yê xweşkuj) işaretê bi DAÎŞ'ê dike. (Lê belê) Ji ber ku li otobusên xwepêşandêr tê de bûn lêgerîn nehate kirin, li mîtîngeke mezin hema bêjin qet polîs tine bûn, dibe sebep ku mirov bawer bikin; hêzên ser bi AKP'ê ji bo vê bûyerê milîtanên DAÎŞ'ê bi taybetî wezîfedar kirine."

## AKP dixwaze pêşî li têkçûyîna xwe bigire



Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku gotina "Operasyonên Qendîl û Şengalê" tenê ji bo pêvajoya hilbijartinan e, dixwazin bi vê yekê muxalefetê bixin pey xwe û HDP'ê bi tenê bihêlin.

Hevserokê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Sezaî Temellî hilbijarinên pêşwext ên Tirkiyê yên 24'ê Hezîranê û êrîşên dewleta Tirk ên bi ser Başûrê Kurdistanê ji ANHA'yê re nirxand.

Sezaî Temellî di serî de bal kişand ser rewşa Selaheddîn Demîrtaş ku niha di girtîgehê de ye û diyar kir ku tu aliyekî xwe yê hiqûqî û meşrû tune ye ku namzetekî serokkomariyê di girtîgehê de bimîne û got, "Heger siyasetmedarekî ji ber fikr û ramanên xwe bixin girtîgehê, ev yek nayê qebûlkirin. Lewma divê birêz Demîrtaş demildst serbest were berdan."
Temellî diyar kir ku êdî gel ji îttîfaqa faşîst a AKP-MHP'ê re dibêje bese û gelê Kurd jî êdî polîtîkayên îmha û înkarkirinê qebûl nake. Temellî eşkere kir ku gelên Tirkiyê 24'ê Hezîranê wek roja hesabpirsînê dibînin û lewma jî xebatên wan ên hilbijartinê bi kelecan didomin. Temellî got ku gelên Tirkiyê dê di 24'ê Hezîranê de koalîsyona AKP-MHP'ê di sindoqan de bihêlin.
Temellî da zanîn ku îhtîmal tune ye ku HDP`ê di bin benda hilbijartinê de bimîne lê belê hikumeta AKP'ê nemaze li bajarên Kurdistanê bi hîleyên yekkirina sindoqan dikare pêşî li îradeya gel bigire. Têkbirina vê lîstikê di destê gel de ye."
Temellî diyar kir ku gotina Erdogan a mudaxelekirina li Minbic û bakurê Suriyê jî ne tenê hesabekî hilbijartinan e, her wiha xwestekeke Erdogan e. Temellî wiha dewam kir: "Me halê vê xwestekê yê berbiçav li Efrînê dît. Gotina operasyonên Qendîl û Şengalê ji bo pêvajoya hilbijartinan e. Jixwe ev demek e li hemberî Qendîlê oprerasyon tên kirin. Helbet dixwazin zêdetir ber bi nav başûrê Kurdistanê ve biçin. Li gorî me, ji ber ku îttîfaqa AKP-MHP'ê fehm kir ku dê winda bike lewma jî dest bi galegala operasyonê kir. Ev konsepta êrîşan jî li Amedê da destpêkirin. Dixwazin di ser cenazeyên leşkeran re tevahiya muxalefetê bixin pey xwe û HDP'ê bi tenê bihêlin."
Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî wiha dawî li nirxandinên xwe anî: "Em dixwazin muxalefeta Tirkiyê, heta tevahiya welat hişyar bikin; ji ber ku AKP'ê fêm kiriye wê winda bike welatiyên vî welatî û leşkerên wê dişîne şer. Erdogan bi awayekî eşkere rojên ku pala xwe bide tabûtan dixwaze. Bi vê yekê ketiye pey provokasyonan. Divê haya tevahiya Tirkiyê ji vê yekê hebe."

## Minbicê têra wan nekir niha Qendîl xistine rojevê



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mistefa Karasû di gotara xwe de ya li rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê de gefên rejîma AKP-MHP'ê yên li dijî Qendîlê nirxand.
Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mistefa Karasû diyar kir, tifaqa faşîst a AKP'ê ev sê sal in bi hemû derfetên xwe êrîşî tevgera azadiyê û gelê Kurd dike, lê dike nake nikare encamekê bi dest bixe.
Karasû diyar kir, di sala 2018'an de desthilatdariya AKP-MHP'ê hem li hundir hem jî li derve gelekî qels bûye û anî ziman, êrîşa li ser Efrînê tevî ku ji bo mayina li ser desthilatdariyê hate kirin jî, destekeke civakî ya têrker ji bo AKP'ê neafirandiye.Karasû da xuyakirin ku li gel hemû êrîşên xwe jî tifaqa AKP-MHP'ê li ber ketina ji desthilatdariyê ye û ji bo pêşî li vê yekê bigire jî, xwe li polîtîkaya geşkirina şovenîzmê girtiye.Karasû ragihand, hevdîtina Wezîrê Karên Derve yê Tirk û Wezîrê Karên Derve yê DYA bi vê armancê gelekî hatiye nepixandin û got, "Halbûkî li ser mijara Minbicê tiştekî nû nîne. Peymana ku berî şerê Minbicê hatibû amadekirin, ji nû ve hatiye erêkirin. Ew biryar jî bi vî rengî ye: Piştî ku DAÎŞ ji Minbicê hate derxistin wê Minbic ji aliyê Minbiciyan ve bê birêvebirin; Meclîsa Leşkerî ya Minbicê wê bi erka parastina Minbicê rabe. Ji xwe ya ku niha li Minbicê heye, ev e."
Karasû diyar kir, nepixandina mijara Minbicê xuya ye têra AKP'ê nekiriye ku di hilbijartinê de bi ser bikeve, lewma niha operasyonek li dijî Qendîlê xistiye rojevê.
Karasû got, "Bêguman eger ji desthilatdariya AKP-MHP'ê were kêliyeke bi tenê jî nasekine, wê berê xwe bide Qendîlê. Eger heta niha ev nekiribe, ji ber ku jê nayê. Serokê Fermandariya Giştî Yaşar Buyukanit beriya niha bi salan gotibû, 'Çûyîna wê derê ne hesan e, gelî û çiyayên xwe hene ku serdestî lê nabe'. Bi vê gotinê eşkere kiribû bê çima nikarin biçin Qendîlê. Niha Tayyîp Erdogan dibêje 'em ê biçin Qendîlê'. Devlet Bahçelî ji xwe bi salan e dibêje. Lewma hewesa wan a çûyîna Qendîlê tiştekî nû nîne."
Mûstafa Karasû diyar kir, rejîma AKP'ê ji tirsa windakirina desthilatdariya xwe dikare bi her awayî dînîtiyê bike û got, "Lê belê gefên ku niha li Qendîlê dixwe, propaganda ji bo serketina di hilbijartinê ye. Eger ji xwe bawer bin ku dikarin bikin, wê yekser bikin. Lê belê ji tirsa ku bi berxwedana li dijî wan bê kirin wê ji hev bikevin, bi hêsanî tiştekî wiha nakin. Hewldaneke bi vî rengî wê veguhere pêvajoyeke şerê navbera Tevgera Azadiyê ya Kurd û dewleta Tirk ku encamên xwe wê siyasî û dîrokî bin."